Navê min Se'ed Ferso ye, di sala 1958an de hatime jiyanê, ez ji gundê Til Erbîd im, mîna hemû civaka Kurdî min zarotiya xwe li gund bûrand, jiber ku gundê me bi tevahiya xwe Komonîst bûn, cudahiyek mezin di navbera me û gundên heremê de hebûn, em zarok bûn, me siyaset nas kir, me partî nas kirin, her wisa jî me xwe nas kir. Min dibistana xwe ya seretayî li gund bûrand. Min çavê xwe vekir, min tembûr di mala xwe de dît, birayê min ê mezin Asî li amûra tembûrê dixist û pir pspor bû, her wisa hin xortên dî jî hebûn di gundê me de li amûra tembûrê dixistin, di piraniya malên gundiyan de radyo hebûn, helbet stran jî dihatin weşandin, mûzîka Erebî bala min kişand, min ew stran ezber dikirn, mamostê dibistanê her roj ez radikirim û stran ji min dixwestin, sebaretî mûzîk û hunera Kurdî min baş stran ji birayê xwe Asî girtin, her wisa di gundê me de pir jin hebûn çaxa ku kesayetyek diçû ber dilovaniya xwedê ewan jinan zehf stranên şîniyê digotin, ewan stranan bala min kişandin, min dizanî ku hunera Kurdî zengîn e, her wisa jî çax ku dawet û xwestin û guhestin çêdibûn, zehf stranên ast bilind dihatin gotin, min pir ji wan stran û mûzîka wan hes dikir.

Piştî ku min dibistana xwe ya seretayî bi dawî kir, ez hatim bajarê Qamişlo û min xwendina xwe kir hetanî ez bûm mamoste di dibistanên bajêr de.

Berî çend mehan ez li mehrecana helbesta Kurdî hazir bûm, ji 80ê helbest û helbestvanî min 5 helbest nedîtin, mixabin ev rastiyeke"

– Di kîjan salê de hunermend Se'ed Ferso, biryar da ku ew strana bêje, û li amûreke mûzîkê bixe?

Wek ku min diyar kir, di zarotiya xwe de ez fêrî amûra tembûrê bûm, û min stran jî digotin, lê cara yekem ku ez derketin li ser dika şanoyê ji bo ez strana bibêjim ew di sala 1979an de bû, ez di Koma Aştî(السلام) a Komonîstan de bûm. Ew sal ji bîra min naçe, em çûn Girê Mozan, û min ew aheng serkeftî derbas kir. Ji wir riya min ya hunerê despê kir.

– We çiqasî xwe di amûra tembûrê de serkeftî didît, nexasim wek we got, hûn bi mûzîka Erebî û amûra ûdê ve hatibûn girêdan?

Min amûra ûdê nedîtibû, tenê min wêneyên ûdê dîtibû, lê heraynê dengê wê bûm, hest dibûm ku dengê ûdê nêzî dengê min e. di sala 1981ê de ez çûm leşkeriyê min rahişt ûdê gelek pêr rehet bûm, loma min tembûr danî, û ûd bû hevala min. Min bi ûdê gelek awazên Kurdî û Erebî çêkirin, di sala 1980ê de kasêtek derket awazên min tê de hebûn, wek strana "Xwendin Nebe Kes Naçe Pêş" bi dengê Beha Şîxo bû, û hunermend Selah Resûl jî pê re bû. Min gelek helbestên Kurdî awaz kirine. Jiber min ne wek dengbêj xwe da nasîn, ez wek awazjen dixebitîm.

–Çaxa hûn hatin bajarê Qamişlo, we têkilî di warê hunerê de bi kê re kirin?

Hunermendên navdar di wî heyamî de hebûn, bi rastî min nikarîbû bighim wan, jiber ez hîn piçûk bûm, anku sîpe bûm, min digot belkî pêşwaziya min nekim! Ê bêtir ez diçûm rex wî rehmetiyê Kamîranê Hesarî bû, hunrmendekî pir jêhatî û serkeftî bû, min û wî pir kar bi hev re kirine, xwedê wî bi dilovaniya xwe şa bike. Hinek din jî hebûn ji nifşê min bûn, pir jêhatî bûn, lê mixabin windabûn, hina ji wan tembûr û mûzîk a vêtin piştxwe, û hin jî koçber bûn. Ew jî sedema ku hunermendên mezin û navdar hebûn, û ew negihan mafê xwe û derfetên mezin ji wan re çênebûn ku bên naskirin û navdar bibin.! Piştî vegera Mihemed Şêxo min serdana wî kir ew hevalê birayê min bû, min tenê lê guhdar dikir, min yek pirs jî ji Mihemed Şêxo nedikir, pir razîbûna xwe ji ûd û bizqa min re dida.

– Her kes dengê Se'ed Ferso nas dike, ku ew pir nêzî dengê Mihemed Şêxo ye, lê Se'ed Ferso bixwe ji heskiriyê Se'îd Yûsiv e?

Strana xweş kêfa min ji wê re tê, stranên ku ez dibêjim, ew stran nêzîkê min in, ji wan hes dikim heyanî ku dibêjim, ferehiya di dengê min de alîkariya min dikir ku ez stranê Mihemed Şêxo bêjim, lê stranên Se'îd Yûsiv ew giyanekî din e, dixwazim hemû rengan bibêjim, netenê stranên xemgînî, lê belê stranên şahiyê û stranên Erebî jî dixweazim wan tevan de gewdek xweş de ku ez pê re rehet dibim bibêjim. Eger hunermendek nû hatibe naskirin û strana wî xweş be, û li dilê min bixe, yekser ez ê wê stranê bibêjim, tucarî jî nabêjim ku ew nûhatî ye yan jî ez bi temenê xwe yê hunerî jê mezinti rm.

" Wê rêjeya herî kêm, û pir kêm bimîne, ji ber di vî heyamî de huner bûye bazirganî, û ji %70 bûye dizî, û di vê babetê de xwe pir xemgîn dibînim, ji ber ku wê pirtûkxaniya mûzîka Kurdî sêwî bimîne".

– Di despêka ku we berê xwe da huner û mûzîka Kurdî, di wî heyamî de kî bû hunermendê nimre yek, di Rojavayê Kurdistan de?

Bêguman Se'îd Yûsiv bû, eger niha jî em werin û bidin ber pîverê dîsan Se'îd Yûsiv e. Çima Se'îd Yûsiv? jiber ku ew tembûrvanekî nimre yek bû, û wek awazjen jî bêguman nimre yek e, jixwe wek helbestvan jî ku wî gotinê stranê xwe dinivîsandin dîsan nimre yek bû. Carekî ji hunermendê navdar Ebdulhelîm Haviz pirsîn ka kî bêtir navdar e, ew yan Ferîd El-etreş, û di wî heyamî de nakokî jî di navbera wan de hebûn, lê Ebdulhelîm Haviz got: " Ferîd El-etreş netenê hunermend e, ew awazjenkî serkeftî ye, û dengê wî jî pir xweş e, nikarim xwe bighînim wan de digotin, lê wek hunermend û ez herim şahiyan lidar bixim min nekiriye. Ji ber ku dengê min 'eyînî dengê hunermend Mihemed Şêxo bû, di dawet û şahiyê ku ji bo wê hatibûm xwestin, ji min dixwestin ku ez çend stranan bibêjim. Carekî ji caran şahiya mala xalê min bû, berê dawet û şahî hemû li taran çêdibûn, min çend stran gotin, xalê min gote kurê xwe here bila hunermendê dawetê hin stranên dîlanê lêbixe rê û rêwanî di taxa me de nema xelk ji dûr hatin ji wan we ye ku Mihemed Şêxo stranan dibêje û xalê min jî ji hatina ewqas xelkê tirsiya.

– We ji kê re xwendiye û awaz û stran çêkirine?

Wek min got helbesta Taha Xelîl ya li ser bajarê Helepçayê bi zimanê Erebî bû, min awaz kir, û min li ser dika şanoya komonîstan strand, min ji helbestên: Helîm abû Zêd, Nesrîn Têlo, Seydayê Ûsivê Berazî(Bêbuhar), Seydayê Tîrêj, Seydayê Keleş, Sebrî Botanî, Seydayê Cegerxwîn, Ferhadê Icmo, stran çêkirine.

– Hûn wek awazjen xwe didin nasîn, gelo bi we re bûriye ku hunermendekî Kurd helbestek daye we ji bo hûn awzan jê re çêbikin, anku ev pisporî heye?

Na mixabin çênebûye! Ji ber piraniya hunermendên me qure ne, ew helbestan dinvîsin, awazan çêdikin, çaxa ku li karê wan guhdar dikim, pir xemgîn dibim, di asta herî nizim de ne, û cihê mixabiniyê ye. Hunermendê Kurd wek kêmaniyekê dibîne çaxa here rex awazjenkî û jê bixwaze ku helbestekê awaz bike. Tevî rêzdariya min ji hemû alavên ragihandina Kurdî re, lê hema çi stran be tê weşandin, mixabin.!

– Di pirtûkxaneya hunera Kurdî di rojavayê Kurdistan de, wê ji 100% çiqas stran bimînin nemir?

Wê rêjeya herî kêm, û pir kêm bimîne, ji ber di vî heyamî de huner bûye bazirganî, û ji %70 bûye dizî, û di vê babetê de xwe pir xemgîn dibînim, ji ber ku wê pirtûkxaniya mûzîka Kurdî sêwî bimîne.



Heger ez kilîpekî ji xwe re çêbikim û ew li ser hesabê nanê zarokê min be, ew mûzîk û strana Kurdî hemû ji min re nelazim e"

– Strana yekem ku hunermend Se'ed Ferso bi dengê xwe tomar kir?

Di sala 1990î de min albomek tomar kir, mixabin ew albom nehat naskirin, jiber xwediyê tomargehan bazirgan bûn, stranên şahî, û dîlanan di tomargehên xwe de vêdixistin, û alboma min û stranên min li wan tomargehan nehatin vêxistin û firotin.

– 35 sal liv û bizava hunermend Se'ed Ferso di gastîna huner û mûzîka Kurdî de heye, çima Se'ed Ferso navdar nebû?

Sedemin hene ez naxwazim wan bibêjim, û sedemin hene ji min in! Sedema ku ji min, ji ber ez xwe nabînim hunermend, a din abûriya min alîkariya min nekir ku ez gelek alboman çêbikim ji bo xelk min nas bikin. Min xwedîkirina zarokên xwe pêwîstir didît ku ez wan pereyan li albomek xwe bixim. Rast e, karekî mezin e, lê ku zarokên min jî birçî bin zor zehmet e. Sedema herî mezin ji nenavdariya min re ew e ku ragihandina Kurdî pişta xwe daye hunera Se'ed Ferso!!

– Di nav hunermendan de jî mixabin pir nakokî hene, ew nakokî çima çêdibin? Nexasim ew yekîtiya ku we ragihandî û di demek nêz de jî têkçû!?

Dixwazim vî tiştî bibêjim ku hîna Hunermend Mihemed Şêxo sax bû, em gihan hev û me xwest ku em Yekîtiyekê ji hunermendan re çêbikin, mixabin me bi hev nekir û heta vî çaxî jî em nagihan hev mixabin, çaxa ku saziyên me tune bin ku alîkariya hunermendan bikin, wê halê me ev nakokî û nehevaltî be, rola partiyan jî di vê babetê de hebû, ewan jî dixwestin hunermendan bi xwe ve girêbidin. Di sala 2006an de em 33'ê hunermend lihev civiyan û me kongirek lidar xist, di wî kongirî de ez hatim hilbijartin wek Serokê Yekîtiya Hunermendên Rojavayê Kurdistan. Me hin kar jî bi navê yekîtiyê kirin, lê mixabin hin dest ketin nav me de û ew kar jî têk çû.

– Di van salên dawî de, diyar e liv û bizave Se'ed Ferso û çalakiyên te, di navendan de, aheng û semînarên partiyan de ne. Hûn ji bo stranekê tenê bêjin vê vexwendinê erê dikin?

Ez dixwazim bi zelalî û bê tirs li ser vê babetê baxivim, partiyên me her ku alîkariya me nakin, lê pêwîst e ku şerê me jî nekin!, ez diçûm ahengên hemû partiyan, eger tu neçî wê şerê te bikin, û eger tu herî, te bê qedir û qîmet pêşwaz dikin. Ez çûme Başûrê Kurdistanê jî ti qedir û qîmet ji min re nehat kirin, tenê dixwestin ez ji navenda çand û hunera wan re stranan tomar bikim. Her wisa ez di vê rewşê de dibûrim, heger ez kilîpekî ji xwe re çêbikim li ser hesabê nanê zarokê xwe ev mûzîk û strana Kurdî hemû ji min re nelazim e, ez diçim ahengên partiyan ji bo tenê şerê min nekin, û hew!!

– Di van pênc salên bûrî de, şoreşek li dar e, liv e, bizav e, ragihandineke xort heye, Se'ed Ferso çi ji bo vê liv û bizava mezin kiriye?

Ez nizanim strana ax, û ox, û em tên kuştin bêjim, ez li ser hin Karin mezin dixebitim, wek min di destpêkê de got ji bo ew kar bimînin nemir, û di pirtûkxaniya mûzîka Kurdî de, werin hilandin.

– Helalê hazir, helbestvanê stranî, heqê helbestê didinê ji bo ew helbest bibe straneke serkeftî?

Na! di vê demê de min hîn ew helbestvan nediye, ji ber ku nivîsandina helbestê hindekî nizim bûye, berî çend mehan ez li mehrecana helbesta Kurdî hazir bûm, ji 80ê helbEst û helbestvanî min 5 helbest nedîtin, mixabin ev rastiyeke.

– Bi sedan hunermendên Kurd ji Rojavayê Kurdistan koçber bûne, hûn çawe vê pirsgirêkê dixwînin?

Koçberî bixwe xisareteke mezin e, ji gel û zemînê re, nexasim ku yê koçber afrêner û hunermend be. Ji dîroka gelê Kurd ve, û ew bêkes e, bêxwedî ye, û her û her, bi xemgînî me li ser gelê xwe stran digotin, di heyamê berî şoreşê de jî tirsa rêjîmê hebû, destêwerdana partiyan di nav hunermendan de hebû, lê kar dihat kirin. Di vê şoreşê de û evqas azmanê azadiyê, yê hunermend jî dît ku gel ne gelê wî ye, partî ne partiyên wî ne, loma berê xwe da koçberiyê, tevlî ku ez şaştiyeke mezin dibînim ku hunermend û afrêner koçber bibin. Ez xwe wek mînak bavêjim vê rojevê, ez nejiber ku bi bajarê xwe ve girêdayî me koçber nebûme, lê ez ji xerîbiyê hez nakim. Û hew!

– Di salên berî şorşa Sûriyê de, gelek hunermendên Rojavayê Kurdistan ji bo Ewrupayê, li ser aheng û newrozan dihatin xwestin, gelo hûn çima carekê nehatin xwestin?

Li ser vê babetê tişta ku ez dizanim, ew tenê têkilî ne, yê min ew têkilî tune bûn loma ez nedihatim xwestin. Ew ne şêwaza kî deng xweş û mûzîk xweş e, dibe ku ew li ser şêwaza ku kî bêtir kare ji wan re xelekên dîlanan veke, li ser asta hemû Kurdistanê ez bi tenê şêwaza Mihemed Şêxo tînim, û stranê wî dibêjim. Diyar e ku Kurd nema ji vê hunera ast- bilind hez dikin. "DunyaTV" li Bakurê Kurdistanê ji bo bîranîna Mihemed Şêxo li min geran, û ez du caran hatim xwestin li ser TV ya wan, ne ez wan nas dikim, û ne ew min nas dikin, lê dengê min bihîstibûn, û gotin divê ku ev bibe mihvanê me. Ma gelo gelê me yê Kurdê Rojavayê Kurdistan ku li xerîbiyê rûniştîne Se'ed Ferso nas nakin.!?

– Çima Hunermend Se'ed Ferso her çax û wextî reşbîn e, û ne geşbîn e?

Li gor ez rojevê dişopînim, û bi taybet di rewşa hunermendan de, di Rojhilata Navîn de, ew dezgehên wan ragihandina wan hunermendên xwe datînin ser serê xwe, di rewşa me ya Kurdî de, tevlî ku dezgehên me û ragihandina me wek a wan lêhatiye eger ne bêtir be jî, em li hunermendê xwe guhdar nakin, wek ku ew tune be. Çaxa ku tu bê hêvî be, helbet tê li mala xwe rûnê, û bicarekê jî negeşbîn be.

– Di jiyana te ya hunerî de, ku nêzî 35 sala ne, Se'ed Ferso dixwest çi peyamê pêşkêşî gelê xwe bike?

Her û her xwestek û peyama min ku ez karibim hunereke serkeftî ast bilind pêşkêşî gelê xwe bikim. Û heta ez sax bim jî ez ê li ser vê xetê kar bikim.

– Ji nifşê nûhatî, hûn hêviya parastina huner û xeta ast bilind, di kê de dibînin?

Niha û di nav hunermendên Rojavayê Kurdistan de, ez hunermend Şeyda dibînim ku ji hunera xwe hez dike, û ne bi erzanî rahiştiye vê hunerê. Lê dîsan dibêjim ku gulek buharekê çênake, dibe ku yên wek Şeyda gelek hebin, ji hunera xwe hez bikin.

– Di dîroka xwe de, Se'ed Ferso çi xelat wergirtine?

Min gelek xelat wergirtine, lê dixwazim bibêjim û bila li min negrin ku ew ne dezgehên mezin in. Yekîtiya Nivîskarên Kurd Xelata Rezoyê Osê diyarî min kirin. Ji hêla partiya Pêşverû ve jî hatime xelatkirin. Ji hêla 7 rêxistinên jinan ve hatime xelakirin. Komîta Maf a Mafê Mirovan ez xelat kirim. Ji aliyê Koma Qamişlo ya serbixwe ve jî hatime xelatkirin. Partiya Wehidê "Yekîtî" jî ez xelat kirim.

Gotina dawî?

Şîreta min ji hunermendan re, ne pêwîst e hûn stranan çêbikin, a pêwîst ew e ku hûn hunerek ast bilind serkeftî pêşkêşî gelê xwe bikin, eger we di heyamê salekê de nav da, hûnê hemû salan wisa nemînin navdar eger hunerek ast bilind di destê we de tune be hûnê wek gelekan winda bibin..

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Ber Bi Sala Nû a Perwerdeyê.. Arîşe.. Guman û Hêvî

Kemal Necim

Li Rojava sala par cara yekemîn perwerdeya bi zimanê Kurdî li dibistanên fermî hate despêkirin, perwerdeya xurû bi Kurdî weke gava yekemîn bi meteryalên nû jibo sê refên destpêkê hate dayin. Aliyên têkildar gotin ku sala perwerdyê bi gelek arîşe û zehmetiyan derbas bû, lê bi serketin jî bi dawî bû. Malbatên Şagirtan hin bi guman in hin jî kêfxweş in. Saziyên têkildar van rojên bêhinvedana havînê behsa amadekariyên berferh ên sala xwendinê ya nû (2016-2017) dikin, lê bê guman dê sala bêjî bi gelek zorî û arîşeyan re rû bi rû bimîne, bi taybet ku tê gotin dê meteryalên xwendinê jibo refên çaremîn ta şeşemîn jî bibin xurû bi Kurdî.

Ji bilî arîşeya siaysî ku li derdora mijara perwerdeya bi zimanê Kurdî destpêka sala buhûrî rû da, ev ezmûna nû di nava civakê de carna bi xweşbînî carna jî bi guman hate pêşwazîkirin, sedemên xweşbîniyê ji xwe diyar in ku wek pêkhatina xewna salan a civaka Kurd bû.

Lê guman û fikarên civakê jî pir bûn, yek ji guman û fikaran derbarê pêşeroj û dahatûya zarokên wan de bû, ka dê zarok xwendina xwe ya bilind bi kîjan zimanî bidawî bikin, ka dê diplomayên perwedeya Kurdî di zanîngehan de bê perjinanain an na? û ya girîng jî ew bû ku dê û bavên bi Kurdî naxwînin dê çawa li malê alîkariya zarokên xwe bikin.

Gumaneke din jî aliyê beşek rewşenbîr û ronakbîran ve bû ku gelo dê zimanê Kurdî têra perwerdeyê bike? Zimanê Kurdî dê têra gihandina zanyariyên hemdem û bîreweriyên bîrkarî, biyolojî HWD bike? Dîsan gelo dê mamosteyên ku cara yekemîn bi Kurdî waneyan bidin dê têrê bikin ku van zanyariyan bighînin Şagirtan?

Ji xwe yek ji gumanan jî di derbarê meteryalan bi xwe de bû ku hin fikar hebûn bibin alavên fêrkirinên Îdeolojîk, herwiha li gorî beşekî rewşenbîran zimanê Kurdî di aliyê bêjezaniyê (Terminology) de hîna qels e û pêdiviya zimanê Kurdî bi gelek term û bêjeyên nû yên derbarê zanist, bîrkarî, felsefe, toreyê û HWD heye, lewma zimanê Kurdî di rewşa heyî de dibe ku têra perwedeyê neke.

Aloziyek û arîşeyeke din jî a mamosteyan bû, li aliyekî hijmara mamosteyên ku bi zimanê Kurdî perwedeyê bidin kêm bû, li aliyê din jî hijmareke mezin mamosteyên Kurd ku berê bi zimanê Erebî perwede diden hebû, ev mamosteyên ku her yek ji wan di beşên xwe de pispor e lê nikarin vê pisporiya xwe bi zimanê Kurdî bighînin Şagirtan, di encamê de gelek ji van mamosteyan di ezmûna sala yekemîn a perwedeya Kurdî de bê par man.

Sazî û dezgehên ku sistema perwerdeyê li Rojava birêve dibin kî ne? Yekem desteyên perwedeyê yên girêdayî Encûmenên rêveber li he rsê kantonan e, yan din jî Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk ku di kongreya perwerdeya civaka demokratîk a di Hezêrana 2015`an de hate lidarxistin de hate damezrandin, ji xwe kongerya mijara gotinê bi beşdariya Şaxên Yekîtiya Mamosteyan û Saziya Zimanê Kurdî hate lidarxistin. di wê kongreyê de biryarên derbarê sala perwerdeyê de hatin girtin, jê û Şûn de hemû amdakekarî (peydakirina mamosteyan û çapkirina pirtûkan hatin kirin).

Di nava sala perwerdeyê de rayedarên têkildar diyar kirin ku ew rastî gelek alozî û arîşeyan tê, yek jî kêmbûn û qelsbûn mamosteyan e, ji ber ku meteryal nû bûn û mamoste derbarê dana wanyan de nehatibûn perwerdekirin.

Bi dawîbûna sala perwedeyê ya 2015-2016an aliyên têkildar li xwe mukir hatin ku gelek kêmasî û kurtî hebûn, lê li gorî ezmûna yekemîn sal bi serkeftin bidawî bû, herwiha ewê sûdê ji kurtî û kêmasiyan bigrin.

Niha ku dema bêhinvedana havînê ye, li gorî daneyên heyî ji sala perwerdeyê ya 2016-2017an amadekariyên berfireh û lezgîn tên kirin. Lê bêguman dê sala nû jî bi gelek arîşeyan re rû bi rû bimîne, bi taybet ku tê gotin dê meteryalên xwendinê jibo refên çaremîn ta şeşemîn jî bibin bi Kurdî.

Ji bo bandorên neyênî yên van arîşeyan kêmtir bibin pêwîstî bi hin kirinên girîng heye.

Yekemîn pêwîst e mamosteyên ku sala berê perwerde dan, derbarê metodên hînkirinê û pedeolojiyê de bêne perwedekirin, her wiha mamosteyên pispor ku berê bi zimanê Erebî perwede dikirin jî, derbarê zimanê Kurdî û dîsa derbarê metodên hînkirinê û pedeolojiyê de bêne perwedekirin û pêdiviyên wan ên darayî bêne pêkanîn.

Di mijara amadekirina meteryal û pirtûkên perwerdeyê de jî pêwîst e xebateke bi baldarî bê rêvebirin, pêwîst e akademisyanên pispor, zimanzan, rewşenbîr û mamosteyên xwedî ezmûn tevlî nava vê xebatê bibin, her wiha pêwîst e sûd ji ezmûnên herîmê û cîhanê bê girtin.

Xebateke din a girîng ku pêwîst e bê kirin jî xebatên derbarê peyvsaziyê (Terminology) de ye, bêyî vê xebatê dê xebatên amadekirina meteryalên bi Kurdî qels bimîne, ango pêwîst e peyvên nû bêne sazkirin û têkevin nava ferhenga zimanê Kurdî. Di vê mijarê de pêwîstî bi dezgeheke peyvsaziyê heye, endamên dezgehê pêwîste akademisyoan û zimanzanên pispor bin, ji xwe di vê mijarê de dikarin sûdeke mezin ji dezgehên têkildar li parçeyên din ên Kurdisatanê bigrin.

Bê guman çi ezmûneke nû dê rastî gele zehmetî û arîşeyan bê, lê gelê Kurd ku bi salan ji perwedeya zimanê dayikê bêpar maye, dê vê derfetê ji destê xwe bernedê û dê hêviya sedê salan bi kelecaneke mezin pêk bîne.

Bagelîşk Û Konê Civakê

Jaff

Di hindiruyê her civakekê de, gelek taybetmendî û nirxên beha hene ku jê re dibin pênas û nasname. Lê heta çi radeyê ew civak wê karibe berevaniyê ji hebûna xwe bike û tevî guhertinan jî wekxweya xwe biparêze?.

Hemû civakên cîhanê û bi taybetî yên Rojhelatî, rastî du ezmûneyên dijwar û hestiyar hatin, yek ji wan, peydabûna olên esmanî bi taybetî Mesîhiyet û Îslam, ya duyan - zêdetir bandora xwe li civakên Rojavayî kir - peydabûna dewleta netewî.

Ji bo zêdetir ruhn bibe ez ê mînakeke zindî bidim pêş:

Civaka Erebî berî hatina Îslamê ji reng û behweriyên cuda pêkhatibû, bi dehan pût û xwedawend li bajarên Erebî de hebûn.

Lê hindek xalên weke ziman, kinc ew cudahî li bin konekî de li hev dicivandin ku em ê jê re bêjin civak.

PiŞtî hatina ola Îslamê, her tiştê li gel îdolojiya Îslamê ne guncaw ba dihat herimandin heta ku çarenivîsa wî li nemanê rawestiya be. Li demeke kêm de cewherê civaka erebî ji wê pêkhateya corbicor daweşiya û Erûbet kete piziya olê de, wata civaka Erebî biser neket li ezmûna yekê de.

Kurdî yek ji wan miletên herî kevne û gelek vekoler wê çendê piştrast dikin, wek mînak vekoler Mîhirdad Azadî behsê wê çandê dike ku dîroka kurdan vedigere hezarê çarê ya berî zayînê.

Eger em rê bidine hizrên xwe ku azad li asoya dîrokê de bifirin, wê gavê bi asanî em ê rewş û rengê civaka kurdî li her qonaxê de bişopînin. Bi tenê eger em berawirdi-yekê li nav civaka kurdî û civakên dî de çêbikin, em ê zanibin ka çiqas bi hêz bû vîna kurdan li himber pêlên vekirinên olî û êrîşên dagîrker bi dirêjahiya çax û serdeman û çawa ziman, kinc, çand, ken, girî û taybetmendiyên xwe li biŞta xwe dikirin, qonax bi qonax û konê xwe li zozana hebûnê de vedigirtin. Heta vê gavê jî civaka kurdî cewher û ruhê wê kurdî ye tevî ku rêjeya kurdên musilman gelek berz e, lê tiştê giring ew e ku kûrdînîyê reng û sîmayên xwe ne guhartin.

Xaleke dî ku hêjayî behskirinê ye û rastiya vîna kurdan dide xuyakirin, xwepatastina kurdan li berlehiya desthelatên regezperest ku gelek çand û ziman li ber xwe birine tunebûnê. Ji ber giringiya vê xalê ez ê kûrtir dagerim vê pirsê. Gelek civak –bi taybetî yên lawaz- li sînorê desthelatên faŞist de bûn ku çanda civaka desthelat li ser dihat ferzkirin herweha ziman û Şêwazên jiyankirinê jî.

bi vê çandê li gel borîna demê wê civaka bindest sîmayên xwe yên taybet –cewher-ji dest dida ji sixûmetî siyaseta desthelatê û saziyên li jêr fermana wê de, weke fêrkirin û perwerdekirinê. Li maweyekî diyarkirî de ew civaka lawaz ji xwe derdiket û dikete bin konê civakeke dî de.

Lê civaka kurdî tevî avanebûna dewlet û desthelateke kurdî, dijwariya siyaseta welatên dagîrkerên Kurdistanê û zalbûna sîstemên ji dahênana desthelatê ku êrîşeke rastîn bû ji bo daweşandina kurdan ji cewherê wan û kurdîniyê, takê kurd karî xwedî li nirxên xwe derkeve û serkeftina ezmûna yekê dûbare bike.

Bi kurtî, civaka kurdî ya sedê 21ê ji aliyê cewher ve heman ew civaka kurdî ye ya berî sedên salan.

Li van deh salên dawî de, stêrka kurdan li esmanan geŞ diyar dibe. BeŞekî ji kurdisatnê îro xwedî stayiyo ye û bi saya wî alayeke kurdî liser astê cîhanê ya naskirî ye, em karin bêjin me nîvdewletek heye, herweha li Rojavayê Kurdistanê desthelateke kurdî heye, li Bakûr tevgereke çalak heye.

Lê tiştê balkêş ew e ku konê civaka kurdî ji her demî zêdetir rastî bagelîşkan tê. Siyaseta kurdî êdî kariye ku derbasî hiş û mejiyê take kurd bibe. Êdî wisa li takê kurd hatiya ku bêxwe bimeşe, bêxwe raweste. Wata îro siyaset zala bi ser vîna kesê kurd de. Ji ber vê çendê ew nakokiyên îro li siyaseta kurdî de metirsiyeke mezinin ji yekgirtina civakê re, ji xwe nîşanên xeter diyar dibin, weke, her kes kurdîniyê li dervey îdolojiya partiya xwe de nas nake û yê cuda bihizire weke nekurd û gelek caran wek xayîn tête binavkirin.

Nedûr e ku ev bagelîşk stûnên kon biŞkîne û kon bidirîne û her parçeyek bi aliyekê de here.

Boyîn Bi Çavên Lêkolînên Nû Ve

Çima tiŞt heye û ne netiŞt heye?

pirseke ku vê dawiyê ji nû ve de di serê gelek lêkolîner û faysîkerên zanîngehên cîhanê de digere û di ser ku ev bêhtirî sed salî ye xwendin û lêkolîn di vî warî de dibin , lê encam her dem jî kêmbûn û derencamên pê ve girêdayî jî qels û lawaz bûn, û nedibûn rastî û diman hîpothês û nêrînên pûç.

Tê gotin, ku divabû aniha em nebana û em bi carekê re li ser riwê vê gerdûna me ya renge Şîn ne afrînner ne jîndar bana, ji ber ku matêrîye û antîmatêrîye divabûn hevxwe bi xwe nehiŞtibana piŞtî teqîna mezin bi navê (The big Bang) jî tê naskirin, lê aniha pirs ji xwe ne ev e û ne di vir de ye, pirs ewe ka ew antîmatêrîye bi ku ve de çû û li ku ma? heger ev hate naskirin, wê gelek tiştên din jî bi xwe re bide naskirin û wê bihêle em bi ser gelek razên boyînnênî din ve vebin, yên ku heya niha bê xwendin û lêkolîn mane, û wê bihêle em bi ser bersivna mezin ve vebin ji pirsne mezintir re wekû (çilo û çawa Supernova çêbûne, û çilo û çawa qûlên reŞ çêbûn û ew gewd û laŞê xweyî ku li ser û ew taybetmendiyên xweyî pirr sitandin) .

Ez bawerim, ne hew wiha tenê jî , bêhtir jî, wê êdî doseyên çawaniya lidayikbûna jiyanê û wateya wê ya zanistî bi zimanekî fîsîkalînî biyolocî li pey hev bêne vekirin,

Alan Pîr Mem

ji xwe Şandina gemiya Juno berî pênc sala li ser gerdûnê Jupiter û gihiŞtina gemiyênînî wir berî çend rojan, hiŞt ku êdî hêviyên me xurtir bibin û baweriyeke rast bi van proyektan ve bê girêdan.

Lê wê hîn jî hin hebin bibêjin, ka wê ev tev de ji çire baŞ be û em ê çi sûdeyê jê werbigrin? ji xwe bê guman pirs di cihê xwe de ye û reva ji bersivê tirsonekî ye, berî her tiŞtî divê ev yek bê naskirin, ku evqeys milyonên li van lêkolînan dibin ne bi derewan e û helbet armanc jê heye, lê ji kê re, ji xwe ji wan re ye, ji wan gelên ku wilqende pere li ser proyektên bi vî rengî xerç dikin.

lê wê ev zanebûn jî ji hinan re bi tenê re jî nemêne, wê Rojhilat jî bi alîkariya van têgihiŞtinên nû û vexwendina boyînê(onîvêrsom) ji aliyekî din ve nêrînên xwe yên fîlosofî bighîne serî û kêmasiya wêneya dawî ji pergalê boyînê re li gor xwe pîne bike û bi vî rengî serkeftineke mezin diyarî mirovahiyê bike.

di baweriya min de mêthologî û raman û hizrên mêtafîsîkî yên ku ji pûtgehên Sumeran û AŞûr û Hûrî û Îgrîkan derketin destpêka hewldanên di vî warî de bûn, bi armanca dayîna Şiroveykê de di pirsa hebûn û nebûnê de û malzaroka jiyanê û hatina me û hatina wilqende gerdûn û heyv û sitêrk û kevir û laŞên asîmanî, û aniha her tiŞtê ku tê kirin ez dibînim ku berdewamiya vê çirokê ye, lê bi awayekî din, û di ser ku mêthologî nabe zanistî , lê her divê neyê ji bîrkirin, ku gelên kevin jî li hin dirê onîvêrsomê nerîn û pirs ji xwe kirin, an wê ev mêthologî tev de tine bana, di wê serdemê de ev zanistîk bû û îro ji me re nîgaŞ û sawêr û çîrok û çîvanok in, lê ka wê sibe çi li ser zanistiya me bê gotin, kêmasî her heye , lê her destpêk dimêne destpêk û berdewamî dimîne berdewamî, û berbipêŞveçûn bi wan qonaxan ve tevan re tê girêdan.

Ma ez bibêjim, gelo ma va antîmatêrîye heye, çima wê antîgiravîtatisyon (bi wateye hêza kiŞandin û berbixweveanînê) jî nebe .

Hezkirin û Jiyana Civakî

Li vir em li pêŞ du têgehên giring derbarê mirovantî û Şaristaniyê radiwsten. Hezkirin têgeheke bi xwe yî di nava jiyana civakî de, her ew têvile bi Şert, merc, reng û regezên xwe. Lê di heman gavê de herdu girêdanek tund bi hev ve girêdayî ne, wisa derbarê hebûn û nebûnê, xweşî û nexweşiyê, duristî û çewtiyê, avakirin û wêrankirinê..td.

Wisa jiyana civakî ku di hindirê xwe de gelek diyardeyan tîne holê, çi erênî û çi neerênî, pîvana vê yekê jî li asta civakê vedigere, gelo ta kîjan radeyê ber bi pêŞkeftin û Şaristaniyê ve noq çû ye? Weku hûn tev dizanin, li vir em ne babetek nuh tev didin, lê nuhbûn derbarê vê yekê ku nuha û ji destpêka Şoreşa Sûriyê ve, civaka me ya kurdî di rewş û jiyaneke dîtir re derbes dibe, rast e civak ew civak e, lê nîr û rewşa ku nuha tê de dijî ji hemî layan pirr cuda ye, Şoreşê bandoreke pirr mezin li jiyana civakî kirî, gelek tiştên baŞ bi cih kir û gelek tiştên kirêt jî anî holê, dibe ku em karibin carên bên hercarê li ser diyardeyekê rawestin. Bêguman mirov xwezayî bûnewerekî civakî ye, mirov xwezayî ji danûstandin û hemahengiyê bi mirovên dîtir re hez dike, ji xwe ev yek pêdiviya herî giringe ku mirovên pak û normal tenha nikarin jiyaneke durist bijîn.

Bingehîn regez di warê têkiliyên mirov de, hezkirin bi xwe yî, belê hezkirin bi xwe bingeha têkilîyên mirovantiyê ye, wisa evînî, hevkarî, alîkarî, têgihiştin û xweşdîtin bi tevayî çi di warê têkilîyên malbatî de, yan di têkilîyên kar de, yan di têkilîyên evînî de, yan di têkilîyên dost û hevaltîyê de, yan di têkilîyên xebata siyasî di heman partiyê de, wisa derbarê hemî têkilîyên civakî de.

Îca taku em jiyaneke civakî durist ji hemî layên aborî, siyasî, kesayetî, rewşenbîrî û zanistî li ser bingeha hevkarî û têgihiŞtinê ava bikin, pêwîst e em li ser rastiya perwerdeya xwe rawestin, li vir malbat nemaze dê û bav bingeha perwerdekirinê ne. Rast e dibistan û hîndekariyên xwe rolek gewre di warê perwerdekirinê de dilîzin, lê rola bingehîn û ya sereke li dê û bav vedigere, ku di her çend salên pêŞîn de zarokên xwe li ser perwerdekirineke rast û durist xwedî bikin, li ser Şêweyên perwerdekirina nuh ku hezkirin û dilsozî û xweşdîtinî bingehên wê ne.

Wisa heger zarok li ser perwerdekirineke zanistî û nûjen xwedî bibe, her dê xwediyê rewiŞt û sinciyek bilind be, dê xwediyê dilîniyeke mezin be, dê xwediyê bîr û hiŞmendiyeke cuda be, li hember vê ewê berî her tiŞtî zanibe çawa û bi çi rengî bi xwe re û bi hawîr xwe re danûstandinê bike, dê zanibe bi çi rengî pirsgirên xwe û pirsgirên civaka xwe çareser bike. Li vir derbarê jiyana civakî de hezkirin û rewiŞt bi hev re hevdu temam dikin, yek dibe bingeh ji ya dîtir re û her du jî encama perwerdekirina rast û durist in.

Li dawiyê em dixwazin bidin xuyakirin ku hezkirin çareserkirina hemî pirsgirêkan e, û hezkirin bi xwe encama perwerdekirinê ye, û perwerdekirina li ser bingehên zanistî û nûjen riya pêŞkeftin û Şaristaniya jiyana civakê bi xwe yî.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestin Bijartî.. Dilşa Yûsif

Roja Heşrê

Di roja heşrê de
Sê qîzên kurd
ji Dêrsim..
ji Enfal..
û ji Şengal..
pêxwas..
porbij..
tî..
birçî..
bi saw..û matmayî..
ji cerg û qîzaniya wan
xwîn dilop dilop di herikî
Li ber dergehê xwedê ..
pêkve rawestan.

***

Jînengeriya: Dilşa Yûsûf

Helbestvan û Rojnamevan û Wergêr Dilşa Yûsûf, di 10 ê Huzêrana 1968 de li gundê Çetelê ser bi bajarê Dirbêsiyê li Başûr Rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye. Derçûya Peymangeha Çandinê ye.

Qîza Dêrsimî..
bi girî..
bi hewar..
got:
xwedêyo..
zarokên te ..
nûnerên te li ser xakê..
hilgirên ala te
neviyên xîlafeta Osmanî
bi navê te..
min talankirin..
min ji şeref û namûsa min bêparkirin.
Zarokên te..
zarokên min..
bi serê singoyên tivingan vekirin.
Hîna jî ez gêjim
ji bihna xwîna
dê..û bavan
mam û biran
li kêleka min
di nav xwîna xwe de vedigevizyan..
Îjar ev heşra bo çiye?
Em yên kurd ji mêjde heşir bûne gelek ji mêjde.

***

Qîza Enfal jî xwe negirt
hawarkir û gazîkir..
û got:
ewe heman çîroka min e.
Bi bîra min tê,
gelek ji mêjde em heşir bûn,
dema zarokên te
hilgirên ala (Allah û ekber)
ji biyabanan hatin
û hemû kesên min
enfalkirin..
û min bi talan birin..firoştin ..
Hîna jî ez wenda me..
li wê tarîkstana biyabanan
û hîna bîna kîmyebaranê
ji devê min tê.

***

Qîza Şengal jî
bi kirasekî sipî..
bi çavên xweyî şîn
bi mistek ji agirê Laleşa pîroz
bê deng..matmayî
liberdergehêxwedarawestabû..
belê hemî endamên laşê wê bibûn ziman
pêkve hewar dikirin ..
di gotin:
ey xwedê ..
ez jî di rojek ronak de
li ber cavê hemî cîhan
hatim talankirin..
her li jêr alayek reş ..
û li jêr navê te..
(La Îlaha Illa Allah) de
hatim sebîkirin..
hatim serbirîn..
Hîna jî min di nav malzaroka xwe de
tûvê heramê sedan
zilamên serbir hilgirtiye.
Agirê Laleş vemiriye..
û çiyayê Şengal jî
xwe bi termê sedan zarokên min xemilandiye
Îjar ez nizanim hey xweda..
eve heşre?
yan heşra bê dawî
li Şengala minî sebîkrî..
û serbirî nîştiye?

Aramiya Azadiyê

Ey xewna kûr
dema hemî hêvî
bi dawî dibin...
dilê min
heta li ser tarîtiyê jî dişewite
bi vê ronakiya zuha
wek leylanê
li ser xakê.
***

Ey welatê yekem
û dawî...
hîna jî ez
bi aramiya azadiyê
zengilên hevgihînê lêdidim.
Lê belê li ser vê xakê..
her tişt bi xemgînî derbasdibe
wek şopa cengê
wek şopa mirinê.

Aramiya Azadiyê

Ey xewna kûr
dema hemî hêvî
bi dawî dibin
dilê min
heta li ser tarîtiyê jî dişewite
bi vê ronakiya zuha
wek leylanê
li ser xakê.
***

Ey welatê yekem
û dûmahî
hêşta jî ez
bi aramiya azadiyê
zengilên hevgihînê lêdidim.

Şaciwanê Aşiqan

Mize û mey
bo şevbihurkên min
Mizicandina
di biyabana xemê de
bi gul dibe
Ingirandina zaroka
xewnên min
bê aştbûn
Zimanê çav û dil
Gerdelûla giyan î avis
bi nepenî û macereyan
Înata xwedayan
di tenêbûne de
Newresê dizî
xerzikên masiyên
derya min
û hêlîna xwe çêkir...
li ser gevjika dilê min.

Şaciwanê aşiqan
bê destûr
Rûnişt li ser text
û eywana min
Gava min tiliya xwe...
di hunguvê evîna wî de dakir
şanên min veguherîn kelmoz
û gezo bariya
ji her hêlên min.

Bi Xemgînî Derbas bû

Di gel te ey delalê min
min jiyana xwe dirkand
û wateya temenê xweyî wenda dît.

Lê belê
her tişt bi xemgînî derbasbû
wek şopa cengê
li ser xakê.

Aştbûn

Îdî nagrîm li ser raburdû
dê gunehên xwe
yên ku min kiribûn
di dûriya ji te
bi evînê bişom.

Ez ya gunehbar
niha di perestgeha evîna te de
bi sozdariya te
destnimêj dikim.

Gunehê min yê bi tenê
min evîn bi şer guherî.

Ez bê welat û xakbûm
lewma aştnebûm
di gel jiyan û evînê.
Bi şer li aştiyê geriyam
di dawiyê de min zanî
ku jiyan bê sînore
ne ku mirin.
Û niha baştir dizanim
tenê yên lawaz şerdikin.

Cemserê Din

Gava ez wek rûbarekî
tersî cihnûmayê

Ji berhemên çapkirî:

1- (Zenglên Hevgihînê), Berhevoka helbestan, weşanxana Amêrda, Beyrût(2001).
2- (Bakurê Dil),Berhevoka helbestan, Ji weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd- Dihok(2006).

diherikîm
te ji xwe re qiblegeh
avadikir
Dema ji rojhelata min
roj bilind dibû
li rojava
di asoyên tarî de
te xefik vedidan
li pêş umêdan

Ne tu bû
em pêrgî hev hatin
li hinda gelawêjê
li ser duriyana
riya kadizê
te stêrkên rijiyayî
berhev dikirin
Tê kengî ji şîr vebî
û berdî hilmijandina
pêxîra min
emê nebarin
ger tu nebî cemserê din.

Cizbeya Evînê

Ji mêjde
derdê te dikeşim
çawa şev
derdê qeflên tariyê
dikşîne
çawa roj
di bin bazkên xwe de
derdê hêwirandina
perçemokê dikşîne
çawa jinek
her serê heyvê
derdê rijandina
xwîna mirî dikşîne.

Tu bi sanciyan re tê
wekî sehmasiyekî
qîlên xwe
li komerîşka
stêrkên min didî
wan yeko yeko
dadiqurtînî
çima tu yê bibî
pîjê ber diranê
maceryên min
û leylana min î
bi çolan şuştî
biçikînî.

Kembera li ser newqa min
dibriqe
ji evînê badayî ye
êdî te nakim kilçîv
min çavê xwe
ji kildanê ezmûnê
kildaye
Keştiya min î
bi ber bayê arezûyên te diket
û bi ser kelexê xwe de
li ber peravên te
hildiweşî
niha di zerya xwesteka min de
avjenî dike

Eger tu dixwazî werî
werî...
lê kum û kolozê xwe dîne
cîhana min bê dergehe
ban û zemînê xwe nîne
ji bo tu bibe berdilkê min
ji tac û eywan
şûr û mertal re
cih nîne.

Ne wek aviyekî
xwe bavêjî nav
keriya min
ne wek xwîniyekî
xwe bavêjî bextê min
û ne wek zarokan
xwe bavêjî kirasê min
di ferhenga evînê de
cih ji lavan re nîne

Ji bo em bi hevre
stêrkan bi hejmêrin
bikin ristik
diyarî ji xwedawenda
evînê re
divê em bibin
tayê wê yî ji eşqê ristî
û di cizbeya evînê de
li ber dergehê
perestgeha wê
bi dilovanî serî dînin.

Bakurê Dil

Bakurê dilê min e ew
di çavên wî de
di meyinim
hunguvê tehlîşka evînê
şima mûm a min e
her şev
şevbuhurkên tenahiyê
cîjwanin
Di rojek serê payizê de
xak bi baranê nermijî
min ew wendakir
bê xatir
li wir.....
li bakûrê dil.

Arezû

Hûn dizanin
kengî ji helbestê
şîrvedibim..!?
Gava navber...
di nava rastiyê û
arezû de
bibe gustîlk
û têxim tiliya
çepê dil.

Hûn dizanin
kengî dibim xwedawend..!?
Gava di biyabana arezû de
rûbarekî bê kendav biherikim.

Hûn dizanin
kengî dimrim..!?
Gava bibim asmanekî
stêrk weriyayî
û aşiqên min xwe
bi benê qederê

darvebikin.

***Helbestek ji bo zarokan**

“Baran”ê Wênekêş

Ezim..ezim..ezim Baran
Zarokekî bi dahênan
wêne dikêşim li ser pelan
ez wêneyan dikêşim
semayê dikim bi rengan

Ezim..ezim..ezim..Baran
ez heme li her ciyan
ez bi sûdim bo cîhan
kesk û sor û şîn û zer
huner ji min re ruh û can

Zengilûn Hevgihînê

Min li çavên te
temaşakir
dema wan min dixwendin
û xwe nîşan girtibûn
li rastiyên razayî
di kûrahiya
çavên min de
Ew hemû
sîper û çeperên
avakirî
nebûn rêgir
ku nehêlin
siwarên daxwaziyên te
têperin
Ew hestên minî razayî
mîna marekî
di çillê zistanê de
te bi tîjkên roja xwe
ya buharî
ku her dem nûdibe
geşkir û serî li wan hilda
Ev êrîşa te
ez rizgarkirim
ji stiranên lorîkan
ku min pê
hestên xwe di razandin
ji bo demek ne diyar
Dil kete lerzê
û careke din
bi awakî ne asan
hilavêt.

***

Ez dizanim
tu ne wek wanî
tu zilamekî ne asanî
te bi çizirandin
derbas nekir çeperên min
şûrê te tazî bû
û wekî qehremanekî
te li dergehê dilê min da
û vexwendim
ji pêkdadanê re.

***

Te diyarên xwe

- Wergerê ji sê zimana dike (Kurdî - Turkî- Erebî).
- Di gel helbestvan u rexnegirê wêjeyî (Luqman Mehmûd) jiyana hevseriyê pêkaniye.
- Niha li welatê Siwêd nîşteciye.

berdan
û dolên kûr
derbaskir
meydanên dirêj
qetand
û tu li kaş û berqefan
rasthat
ta tu gihaşt
benderên min
û va tu dixwazî
û bê dudilî
çengela keştiya xwe
bavêjî kûrahiya
derya hestên min.

***

Dema te ez vexendim
ji nişkave ne bû
şûrê min tazî bû
li ser xwe bûm
amade bûm
min xwe neda paş
ji pêkdadanê
min meydan xwend
li himber te
Dema şûr li hevketin
çingîn anîn û burusîn
wê demê...
zengilên hevgihînê jî lêdidan
û mujda hevgihîna
heta û heta lêdidan
***
Bi cengê
tu bi hêz dibî
û mezin dibî
ez jî li gel te
Eger tu bi şer nehatibayî
te çeperên min
ne didîtin
Eger tu ji koşka xwe
daneketiba
te dergehên min î nizm
ne didîtin
Eger te şûrê xwe bavêta
ber lingê min
û daketa ser çongan
te hêza min nedidît
Eger tu bi hevaltî
nehatiba
te ez nedidîtim
û her nedidîtim.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Ez' an 'Min' û romanek'



Yek ji kedkarên zimanê kurdî ye Omer Dilsoz. Wî cê carê daye ber dilê "Ez" û "Min"ê û romana xwe "Ez û min" lêkiriye.

Omer Dilsoz ku heta niha bi navê 'Hêviyên Birîndar', "Bêhna Axê', 'Neynika Dilî', 'Berbiska Zer' û 'Hevrazên Çiya' 5 roman û pirtûkek helbestan

'Bila gotina min û te jî hebe' gihandibû ber destên xwendevanan îsal romanek din li romanên xwe zêde kir: "Ez û min"

Ez û min wekî hevokak şaş li ber me ye lê derd ne ev e, ev tenê navê romanê ye. Ji ber ku roman bi ser "ez" û "min" de diçe. "Ez" tê vedibêje, dûre "min" tê û wisa roman didome. Dilsoz cureyek cuda bikar aniye û xwendevanan dikişîne nav derûniya wan. Heta dawî bi vî awayî diçe lê carinan "Ezî-Minî" jî dikeve navê û wisa dibêje, "Ew ez bûm, ewê sîbiserdegirtî, ewê morî, ewê biçûcik, ewê hûrik. Ewê bi cama pencereyê ve zeliqî û di qata dehê ya wî bajarê zêdetirî mîlyonekê mirov lê dijiyan, ji bilî bi milyaran morî, teyr û dilûr, kêz û mêşan...

Ez bûm yê ku bi seranser ji aliyê minî ve hatiye dorpêçkirin. Di 'mir'eke bi qasî deryayekê kûr û lemelem de, temenî moriyekî ji karwanî veqetyayî bi serê xwe û di xilolehiya jiyanê de winda.

Ez bûm çav bi kesera hilmek xewê, ku di labîrenta-minî- de rêwinda..." (R.79) Û wisa didome...

Romana ji 94 rûpelî îsal ji Weşanên J&J'yê li Amedê hatiye weşandin.

Wekî nota dawî: Romanên Omer Dilsoz ên berî vê niha çapa xwe ya duyem kirin.

diyarname

Mamik

–Girê didim dice…Ber didim naçe ?
–Evqes dinya diçiyê..Qirşikek naçiyê ?

Bersiva Mamikan Hejmar 46
Kulîlkên Hinarê – jîjo – gûz

Zûbêj

Guvîj û vîjik di kevçî de
Min guvîj xwar vîjik ma di kevçî de

Kurdî–Xweş–e

Pêşrêzkirin >> أستعراض

Radeyî >> نسبي

Bîrnasî >> فلسفة

Raz >> فلسفة

Behane >> حجة, عذر

Pûtedan >> اهتمام

Avend >> لباقة, كياسة

Zîvar >> قطعة, شظية

Pend û şîretên Kurdî

Ê kevnên wî tune be, nûyên wî jî tune ne
Nû hatin kevin hilatin
Kevna em ji bîr kirin, nûha em rû bi qîr kirin
Kevna tenûr dadan, nuha herdû ling radan
Kevna potik didrûtin , nûha qajik dicûtin
Kevna hevîr disitiran, nuha lawik distiran

Xaçerêz

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								■
2					■			
3		■					■	
4			■					
5				■		■		
6					■			
7	■		■				■	
8								

Stûnî:

1- Gundek li rojhilatî Qanişlo kuştarek lê pêk hat.

2- Silava lîstikvanê Karatê - şerşef, lihêf.

3- Xitim. Du tîp.

4- kesên rêgir (Vajî)- Girup.

5- cih û welat – Em (Vajî).

6- Roja sisyan ji heftiyê kêm tîpek. Merov li bin siya wê rûdinê.

7- Dijî rok – xiyar (Vajî).

8- êlek kurdî navdar û mezin e.

Asoyî:

1- çav- firehî.

2- cureyek sebze tûj û şêrîn e – nav bi zimanê Erebî.

3- hal.

4- Na bi zimanê Ingilîzî..

5- Kur bi zimanê Erebî.

6- Rengek. Cureyek xwarin ji genim çêdibe.

7 - Apo «vajî».

8- Navê leşkeran di artêşa Başûrê Kurdistanê de.

Xaçerêz Bersiva hejmara 46an

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	K	Ê	M	E	N	D	A	■
2	U	D	■	H	E	Y	V	■
3	R	■	A	R	■	E	D	L
4	D	Û	■	E	K	■	A	A
5	■	N	A	M	E	■	■	S
6	Î	■	Z	A	N	I	S	T
7	D	R	A	N	■	Î	Î	Î
8	A	R	D	■	N	E	H	K

Peyva wendayî

şoreş-xal-buhar-şahîn-dar-şahînaz-daro-payîz-)
.(dilnaz-şêro-dûrî-xan-şal

Peyva wendayî ji 7 tîpa pêktê, qadek navdare li Rojhi-
.latê Kurdistanê

Ş	O	R	E	Ş	L	A	x
Ç	Z	A	N	L	I	D	B
Z	Ş	Î	D	X	A	R	U
Î	Ş	Ê	R	A	A	ç	H
Y	I	A	R	Û	R	N	A
A	R	A	L	O	D	O	R
P	Ş	A	H	Î	N	A	Z
D	A	R	N	Î	H	A	Ş

Bersiva peyva windayî 46an: Tembûr